

# Berawirdkirinek di Navbera Menzûmeya Şêxê Sen'anî ya Feqiyê Teyran û Nezîreya Wê ya Xemgînê Xanî da

A Comparison Between Narrative Poem Sheikh Sanani of Faqiye Tayran and A Parallel to It by Khemgine Khani

**Müjde SÜLEYMAN**

Müjde SÜLEYMAN | 0009-0002-9338-8456 | diyasavya81@gmail.com  
Mardin Artuklu University Graduate Student, Institute of Living Languages in Türkiye,  
Department of Kurdish Language and Culture, Mardin, Türkiye

## Citation:

Süleyman, M. (2024). Berawirdkirinek di Navbera Menzûmeya Şêxê Sen'anî ya Feqiyê Teyran û Nezîreya Wê ya Xemgînê Xanî da. *Nubihar Akademi* 22, 63-80. DOI: 10.55253/2024.nubihar.1582791

Article Type	Research Article
Submission Date	11.11.2024
Acceptance Date	24.12.2024
Publication Date	31.12.2024
Peer-Review	Double anonymized - Two External
Ethical Statement	It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited.
Plagiarism Checks	Yes – iThenticate
Conflicts of Interest	There is no conflict of interest between the author and any parties in the article.
Complaints	The author(s) has no conflict of interest to declare.
Grant Support	The author(s) acknowledge that they received no external funding in support of this research.
Copyright & License	Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the <b>CC BY-NC 4.0</b> .

## Puxte

Nezîre têgeheke helbesta klasîk e, dema helbestvanek ji helbestekê hez dike yan jî dixwaze helbestê bi heman teşeyê nezmê û carna bi heman naverokê jî binivîse, bi armanca berfirehkirina hin babetan

û ciwanbêjkirina ramanan, nezîreya wê helbestê dinivîse. Gelek helbestvanên serdema nûjen ên ku bi şêwaza klasîk nivîsîne nezîre afirandine, yek ji wan Xemgînê Xanî ye ku nezîreyek ji çîroka menzûm a Feqiyê Teyran a bi navê Şêxê Sen'anî re nivîsiye. Di vê lêkolînê de berawirdkirineke edebî di navbera çîroka şêxê Sen'anî ya Feqiyê Teyran (1563-1632) û nezîreya wê de hatiye kirin ku ji aliyê helbestvan Xemgînê Xanî (1915-2008) ve hatiye nivîsîn; xalên wekhev û yên cuda di navbera herdu menzûmeya de ji aliyê naverokê, teşeyên nezmê, serwa û erûzê ve her weha ji aliyê qebareya herdu berheman ve hatine ronîkirin û hatiye diyarkirin ku herçend serdema nivîsîna vê berhema Xemgînê Xanî ji ya Feqiyê Teyran dûr be jî, di asteke bilind de hatiye nivîsîn ku reseniya helbesta klasîk parastîye û kariye berhemekê di asteke ne kêmî asta Feqiyê Teyran de binivîse.

### **Peyvên Sereke**

Helbesta Klasîk, Feqiyê Teyran, Xemgînê Xanî, Şêxê Sen'anî, Nezîre,

### **Abstract**

“Nazireh” is a term related to classical poetry. When a poet admires a poem or aspires to re-write it by employing the same poetry form or sometimes preserving the same content so as to elaborate more on some of the topics brought about and embellishing the thoughts presented therein, they write a “nazireh” to that poem. Many modern-day poets who wrote by using a classical period poetry style wrote “nazirehs”, one of whom is Xemgînê Xanî who penned a nazireh of the narrative poem of Feqiyê Teyran called Şêxê Sen'anî. This study presents a literary comparison between the story of “Şêxê Sen'anî” by Feqiyê Teyran (1563-1632) and its counterpart written by the poet Xemgînê Xanî (1915-2008). The analysis highlights points of similarity and divergence between the two poetic compositions in terms of content, structures, rhyme, meter, and the overall volume of each work. The study concludes that, despite the significant temporal gap between Xemgîn's work and that of Feqiyê Teyran, Xemgîn's composition is crafted at a high level, preserving the authenticity of the classical poem and achieving a standard that does not fall short of Feqiyê Teyran's masterpiece.

### **Keywords**

Classical Poetry, Feqiyê Teyran, Xemgînê Xanî, Şêxê Sen'anî, Nazireh.

### **Destpêk**

Helbesta klasîk kevintirîn û resantirîn hunera edebî ye; ji ber ku helbest berî hemû hunerên din ên edebî hatiye afirandin û belav bûye. Mirov dikare wê mîna maka pêşîn a wêjeyê bi nav bike. Di gešta dîroka mirovahiyê de ev hunera edebî di gelek qonaxan re derbas bûye, bi riya wê raman û hestên mirovahiyê di hemû babetên jiyana de hatine nivîsîn; çî di warê evîn û hezkirinê de be, an di warê şîn û xemgîniyê de be, an jî di warê pesn û salixdanê de be. Helbest bûye ziman û berdevka tevaya rewş û halên ku mirov tê re derbas bûne, bi riya wan helbestvan hest û boçûn û ramanên xwe diyar kirine.

Helbest di hemû wêjeyên dinyayê de, balyoz û wergêra hestan e û veguhêza peyama nîhad e û ev taybetmendiyên helbestê ne taybetên miletekî tenê ne, ji bo hemû miletan in. Lê tiştê ku miletan ji hev cuda dike hestê nazîk, xeyalê fireh û wijdanê hişyar e. Eger Xwedê van taybetmendiyan bide miletekî, wê helbesta wî di pileyeke bilind de be (Qenawî, 1949, r.10).

Miletan ji mêj ve giringiyeke mezin daye helbestê û “sedema giringîpêdan û guhdana bi helbestê, bandora wê ya mezin a li ser cemawer û guhdaran e” (Mehmûd, 1937, r. 268); ev bandor ne tenê bi demekê destnîşankirî ve sînardar e, dibe ku bi

sedan sal jî di ser berhemekê re derbas bûbin jî, lê hîn bandora wê berhemê pir mezin û kartêker e. Ew berhem resenî û nîrxê xwe yê bilind ji dest nadin. Berovajî wê yekê, her ku dem di ser wan re dibore bêhtir nîrxdar dibin. Vê reseniya helbesta klasîk hiştiye ku qonaxin mezin derbas bike û ta roja îro jîndar bimîne.

Sebareti helbesta Kurdî ya klasîk, tevî derbasbûna bi sedên salan di ser re, ew hîn jî zindî û geş e û bedewiya xwe ji dest nedaye. Ev hemû bi saya berhemên helbestvanên klasîk ên kurd e ku nîfş bi nîfş tînen veguhestin û bûye sedema gihîştina helbesta klasîk a kurdî bi tevaya statîk û spehîtiya xwe ta roja me ya îro. Di edebiyata Kurdî de helbest û dîwanên pir hêja yên ku ji windabûnê rizgar bûne hene. Lê bi qatan ji yên rizgar bûne, yên ku windayî jî hene. Ev helbest eger derfet ji wan re peyda bibûya da ku bi zimanên jîndar bihatana xwendin, wê cihekî wan yê bala di edebiyata cîhanê de peyda bibûya (Doskî, 1993, r. 38).

Li gor berhemên berdest, piraniya helbestên kurdî yên klasîk di serdema Îslamê de hatine nivîsîn. Piştî belavbûna dîne Îslamê li herêmên ku kurd lê dijîn, kurd jî tevî dîne Îslamê dibin û demek dirêj zimanê Erebi dibe zimanê serdest û berhem bi zimanê kurdî nayên berhemdan. Bi taybetî di her dusê qernên pêşî yên serdema Îslamê de (Adak, 2015, r. 162), piştî hêdî hêdî mîletên ji bilî Erebi yên ku dîne Îslamê qebûl kiribûn, di nav wan de mîletê Kurd, dest bi nivîsandina bi zimanê xwe kirine ku berhemên kurdî jî di vê qonaxê de derdikevin meydana. wekû ku tê zanîn Baba Tahirê Hemedanî yê ku yek ji nûnerên helbesta kurdî ya klasîk tê binavkirin, kevintirîn helbestvan e ku di sedsala 11an de jiyaye û berhemên wî gihîştine roja me ya îro.

Qonaxa herî zêrîn ji bo helbesta kurdî ya klasîk, bi taybetî bi zimanê Kurmancî, di serdema mîrektiyên kurdan de bû. Di wê demê de atmosfêreke guncav ji edebiyata kurdî re hatiye peydakirin, gelek helbestvan bûne stêrkên geş di asîmanê wêjeyê de; ji ber ku wan hewl dane wê tarîtiya ku gelê wan tê de dijîya bi tîrêjên fikr û ramanên xwe ronî bikin û bi riya helbestê mîletê xwe hişyar bikin.

Tevî ku helbestvanên kurd di bin bandora dîne Îslamê û zimanê erebi jî de bûn; lê piraniya wan karîbûn kurdûna xwe biparêzin û mîletê xwe jî ji vî alî de haydar bikin. Ehmedê Xanî yê ku bûye sembola neteweya kurdî di edebiyata kurdî de, di vê derbarê de gelek hewl dane û xwestiye ji zarokên kurdan dest pê bike; wan bi zimanê wan ê dayikê hîn bike da ku karibin mîna mîletên din ên derdorê sûdê ji zanîn û ilmê ku wê demê bi zimanê erebi bû, wegirin û rihê kurdewariyê li rexê wan xurt bibe. Herweha beriya wî jî Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran ku van hersî helbestvanan bingeha edebiyata Kurdî ya klasîk danîne û bûne nimûne ji bo helbestvanên din ên ku li dîv wan hatine û dane ser şopa wan û bi berhemên xwe yên zêrîn navên xwe di rûpelên dîrokê de tesbît kirine û piraniya wan heta dawiya jiyana xwe di xizmeta mîletê xwe de di medreseyan de ku li deverên Mîrektiyên kurdan hatibûn avakirin, ked dane û xebat kirine. Hinan ji wan bi xwe jî medrese ava kiribûn.

Ji ber ku hunera edebiyata klasîk ciwan û geş maye, hin helbestvanên serdema nûjen jî hewl dane bi heman şêweyê helbestê binivîsin û bi riya nivîsandina helbestên

xwe yên bi şêweya klasîk, roolekê di berdewamiya parastina reseniya helbesta klasîk de bilîzin. Yek ji van helbestvanan Xemgînê Xanî ye ku di sedsala bîstem û destpêka bîst û yekem de jiyaye û daye ser şopa helbestvanên klasîk ên mîna Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran û Ehmedê Xanî û nezîreyek ji menzûmeya Feqeyê Teyran ya bi navê Şêxê Sen'anî re hûnaye.

Mijara lêkolîna me berhevkerin û berawirdkirina di navbera du berheman de ye, yek ji wan di dîrokeke dûr de hatiye nivîsandin, ew jî menzûmeya Şêxê Sen'anî ya Feqiyê Teyran e ku bêhtir ji sêsed salî di ser nivîsandina wê re derbas bûye, ya din jî wek nezîreyekê ji vê menzûmeyê re ye, di serdema nûjen de (sedsala 20em de) ji aliyê helbestvanekî ji rojavayê Kurdistanê ve yê bi navê Xemgînê Xanî hatiye nivîsandin. Di vê lêkolînê de wê hewl bê dan ku ji aliyê naverokê, teşeyên nezmê, erûzê, serwayê, qebareyê û herweha ji aliyê bikaranîna peyvên biyanî ve herdû berhem bîst nixandî û bê dîtin gelo Xemgînê Xanî çendî kariye terz û şêweya ku Feqî bikar aniye, biparêze.

Giringiya mijarê danasîna helbestvanekî serdema nûjen e ku helbest bi şêwaza klasîk ya resen nivîsandiye û tevaya alav û şert û mercên wê helbestê pêk anîne û parastine. Dema mirov dixwîne mirov dikeve wê gumanê ku ev helbest di serdema kevn de hatiye nivîsandin û bi hemû ciwanbêjî û rewanbêjiya helbesta klasîk ya resen ve hatiye xemilandin.

Armanca lêkolînê ew e, gelo ta kîjan radeyê helbestvan kariye xwe hevkuîf ji Feqiyê Teyran re bibîne û karîna xwe ya helbestvanî bikar bîne ji bo berhemeke ciwan ji aliyê teşeyên nezmê, naverok, erûz û ramanên cuda yên ku di nava xwe de vedihewîne, pêşkêş bike; herweha armanc ji vê xebatê ew e ku asta berhema Xemgînê Xanî ya wêjeyî di nav berhemên Kurdî yên klasîk de bê diyarkirin.

Pirsgirêka lêkolînê ew e ku helbestvanekî edebiyata klasîk a kurdî heye, nezîreyek ji berhema Feqiyê Teyran ya bi navê Şêxê Sen'anî re nivîsiye û ew berhem bi berfirehî ji aliyê teşeyên nezmê, naverokê, bîr û boçûn, raman û xeyala edebî ve nehatiye nixandî. Beriya vê xebatê du xebatkarên edebiyata klasîk, Dr. Ahmet Gemî û Dr. Aslam Jankır, di berhema Xemgînê Xanî ya bi navê Dîwana Şêxê Sen'anî bi Xezela Feqehê Teyra û Xemgînê Xanî de xebitîne û ev berhem ji tîpên Erebi veguhestine tîpên latîni; herweha li ser cihê çîroka Şêxê Sen'anî di edebiyatên farsî û tirkî û kurdî de rawestiyane û hinekî behsa çîroka Şêxê Sen'anî ya Feqiyê Teyran kirine. Lê di wê xebata wan de wek berawirdkirin di navbera herdû berheman de nehatiye kirin, me xwest di vê xebatê de berawirdkirinek berfirehtir di navbera herdû berheman de bikin da ku berhema Xemgînê Xanî bêhtir were naskirin; herweha asta wî ya edebî were xuyakirin.

Di vê xebatê de wê hewl bê dan ku sînorên berawirdkirina ku di navbera herdû berheman de bê kirin, destnîşankirî bin; ji aliyê naverokê ve wê hin mijarên ku di berhema Feqî de tîpên mîna tewhîdê, tesewufê, eşqa îlahî, evîn û dildarî, wefadarî, bandora şêx ya mezin li ser hemû beş û çînên civakê bi mînakên bîst diyarkirin û bê

dîtin gelo di berhema Xemgînê Xanî de jî ev mijar tîn dîtin? Ta çî radeyê Xemgîn kariye berhema Feqî ji aliyê mijarên ku li jorê behsa wan hate kirin bi afirandkariya xwe zengîntir û ciwantir bike. Herweha berawirdkirin ji aliyê teşeyên nezmê yên ku herdû helbestvanan bikar anîne, ji aliyê serwayê ve, ji aliyê erûzê ve, ji aliyê qebareya herdu berheman ve dê bê kirin û hem jî dê ji aliyê bikaranîna bêjeyên biyanî ve, herdu helbestvanan bîn berawirdkirin.

Di vê lekolînê de ji ber ku wê berawirdkirin di navbera du berheman de bê kirin û her yek ji wan di demek û cihêkî ciyawaz de hatiye nivîsîn dê ji rêbaza berawirdkirinê sûd bê wergirtin û berawirdkirin di navbera bendên herdu helbestvanan de bê kirin; ji ber ku ev rêbaz di lêkolînên zanistî de ji bo bidestxistina encaman tê bikaranîn ku mirov bi riya wan digihê xalên wekhev û yên cuda di navbera du rewşên nêzîkî hev de û ev yek bi vê xebatê re guncav e; herweha di berawirdkirina ji aliyê naverokê ve dê sûd ji rêbaza wesfî bê wergirtin.

Em ê gotara xwe li ser du beşan dabeş bikin û bi encamekê xilas bikin. Ji ber ku mijara lêkolînê li ser çîroka Şêxê Sen'anî ye dê di beşa yekê de li ser vê çîrokê û her du nivîskarên wê bê rawestan. Di beşa duyem de dê berawirdkirin di navbera Şêxê Sen'anî ya Feqiyê Teyran de û nezîreya wê de bê kirin ku Xemgînê Xanî li ya Feqî zêde kiriye. Di beşa encamê de jî, ew derencamên ku em di vê xebatê de ghiştine wan wê bîn pêşkêşkirin.

## 1. Çîroka Şêxê Sen'an û Nivîskarên Wê

### 1.1. Çîroka Şêxê Sen'an

Çîrok li ser şêxekî ye ku li bajarê Mekeyê dijî. Şêxekî Xwedanas, alim û zana bû. Çarsed mirîdên wî hebûn. Şêx şevêkê di xew de dibîne ku diçe welatê Romê û ji pûtan re sicdê dike. Ji ber ku Şêx kesekî welî û xwedî keramat bû û zanîbû hikmeteke îlahî di vê xewna wî de heye, mirîdên xwe kom dike û ji wan re xewna xwe şirove dike û ji wan dixwaze ku pê re berê xwe bidin welatê Romê. Mirîd û şêx dikevin rê. Piştî zor û zehmetiyên mezin û seferek dirêj, digihên welatê Romê. Dema digihên welatê Romê şêxê nêzî heştê salî ye, çav li keçikê dikeve. Li ser banekî rawestiya bû. Aqilê xwe ji dest dide û dibe evîndarê wê, nema ji ber deriyê wê keçikê radibe û bi şev û roj li hêviya dîtina wê dimîne. Piştî mirîd şêxê xwe yê zana ku şîretkarê wan bû di vê rewşa xerab de dibînin, hewl didin ku şîretan lê bikin û wî ji vê riya daye ser vegeerîn. Lê şêx qet guh li wan nake. Mirîd piştî demeke dirêj ji hewildanan bi ser nakevin û hêviya wan ji vegera şêxê wan ê berê tê birîn; lewma jî vedigerin û şêx li dûv xwe dihêlin. Piştî vegera mirîdan, şêx dibe şivanê berazên malbata keçîka Romî û xaç û selîban jî dixê histuyê xwe û di encamê de ji dînê xwe derdikeve. Piştî ku mirîd vedigerin welatê xwe. Şêxekî dilsoz bi navê Şêx Etarê Sadiq hebû, li Mekeyê mabû. Ev şêx heval û dostê Şêxê Sen'anî yê nêzîk bû. Dema dibîne ku mirîd bêyî şêxê xwe vegeeriyane, pir aciz dibe û biryarê dide ku ew û mirîdan carek din biçin welatê Romê ji bo şêxê xwe vegeerîn. Piştî seferek dirêj digihên welatê Romê. Şêx

Etare Sadiq û mirîdan çil rojî ji Xweda re secde û diayan dikin da ku li halê şêxê wan binêre. Dawî hezretî Pêxember ji şêx re dibe şefî û şêx careke din li dînê xwe vedigere û tevde dikevin rê ji bo vegerin welatê xwe. Lê keçika Romî piştî vegera şêx di xewa xwe de dibîne ku roj li kêleka wê ketiye û jê dixwaze ku bigihê şêx. Ew jî dikeve rê da ku bigihe şêx. Di dawiyê de keçik digehê şêx û dibe misilman, piştê herdu bi hev re jiyana xwe ji dest didin. Mirîd ji herduyan re tirbekê çêdikin û wan bi hev re vedişêrin û vedigerin welatê xwe. (Cuma, 2002, r. 71; Gemi, 2023, r. 79-80; Gemi, 2016, r.110)

Ev çîrok li gor ku di berhema Mentiqu't Teyr a Ferîduddîn Etar de hatiye. Gelek helbestvanên klasîk ku Feqiyê Teyran jî yek ji wan e, ev çîrok bi şêweya menzûm nivîsandine û her helbestvanekî li gor xeyal û zewqa xwe ya edebî çîrok şirove kiriye û hin guhertin mîna cihan, hejmara mirîdan tê de kirine.

## 1.2. Nivîskarên Şêxê Sen'an

Em ê li vê derê her du nivîskarên Şêxê Sen'an an ku Feqiyê Teyran û Xemgînê Xanî ne bi kurtî bidin nasîn. Feqiyê Teyran helbestvanekî klasîk yê bi nav û deng e (1563-1632), navê wî yê rastî Mihemed Emîn e û navê bavê wî Ebdullahê Miksî ye, ji gundê Warezûrê yê nêzikî Miksê ye, gora wî li gundê Şandîsê ye lê gundiyên wî yê Warezûrê ji ber hezkirina wî, li Warezûrê jî jê re tirbek çêkirine (Zivingî, 2021, r. 55), li gelek medreseyan Kurdistanê xwendiyê nemaze li Miksê di medreseya Mîr Hesenê Welî de, li medreseya Hîzanê, medreseya Cizîra Botan û medreseya Finikê zîdetir xwendiyê (Saginç, 2014, r. 371). Li gor Qanatê Kurdo Feqî hem helbestvan û hem jî dengbêj e, li kêleka helbestên evînî mijarên felsefî û suruştî jî nivîsîne, bi zimanê teyr û tilûran zanîbû, li gel wan diaxivî, her weha li gel suruştê diaxivî (Kurdo, 2019, r. 84). Feqî berhemî giring ji edebiyata kurdî ya klasîk re hiştine û bûne mîna lêvegeran, helbestvanên ku li pey wî hatine sûd ji wan wergirtine û hinan nezîre ji wan re nivîsîne ku yek ji wan jî Xemgînê Xanî ye .

Berî ku behsa nasname û jiyana Xemgînê Xanî bê kirin, pêwîst e ev yek bê gotin, piraniya van zanyariyan xwarê yê derbarê jiyana wî ji qeydeke dengî hatine wergirtin ku di şevbuhêrkeke rewşenbîrî ya ji bo xelatkirina wî de hatibû lidarxistin. Dengê wî û cemawerek ji helbestvan û rewşenbîrên deverê hatiye qeyd kirin û di riya D. Şiyar Silêman re ev qeyda dengî hatiye bi destxistin ku ew jî yek ji beşdarên di wê şevbuhêrkê de bû. Di wê qeyda deng de Xemgînê Xanî diaxive û behsa jiyana û serpehatiyên xwe dike her weha hin helbestên xwe jî dixwîne. Her weha di riya malbata wî jî re me hin agahî bi dest xistine. Navê wî yê rastî Mela Nûreddîn Mihyeddîn e. Di sala 1915an de çavên xwe li jiyana vekirine, hêj temenê wî 10 sal bûn ji bakûrê Kurdistanê, ji gundê Hêşetê, tevî malbata xwe çûye rojavayê Kurdistanê û li gundê Dêrûna Qulinga yê bi ser bajarê Heskê yê rojavayê Kurdistanê ve bi cih bûye. Wî perwedehî li dibistanan bi şêweya fermî nedîtiye, tenê li cem Şêxên deverê mîna Şêx Îbrahîm Heqî û Şêx Salih hînî zanistên şerîeta dînê Îslamê bûye û ew xwe bi xwe hînî xwendin û nivîsandinê bûye û gelek pirtûkên di warê şerîetê de xwendine. Ew ji malbata helbestvan Ehmedê Xanî ye, li gor ku wî behs kiriye dara malbata wî wehaye: Ew kurê Mihyeddîn e,

Mihyeddîn kurê şêx Elî ye, şêx Elî kurê şêx Xeşman e, şêx Xeşman kurê Şêx Ehmed e, şêx Ehmed kurê Şêx Ebdulmecîd e, şêx Ebdulmecîd kurê şêx Ehmedê Xanî ye. Li gor ku wî di wê qeyda dengî de behs kiriye, wî du dîwanên ku ji helbestên evînî pêk tên, çar dîwanên ji helbestên neteweyî pêk tên û berhemek ku nezîre ye ji menzûmeya Şêxê Sen'anî ya Feqiyê Teyran re nivîsandine ku ev xebat jî li ser wê nezîreya wî ye. Hêjayî gotinê ye ku tenê ev berhema wî hatiye çapkirin.

## 2. Berawirdkirina Menzûmeya Şêxê Sen'anî ya Feqiyê Teyran û Nezîreya Wê ya Xemgînê Xanî

### 2.1. Berawirdkirin ji Aliyê Naverokê ve

Berhema Şêxê Sen'anî ya Feqiyê Teyran di nava xwe de gelek mijaran dihewîne. Mînak; Tewhîdê, tesewufê, eşqa îlahî, evîn û dildarî, wefadarî, bandora şêx ya mezin li ser hemû beş û çînen civakê. Gelo di ya Xemgînê Xanî de jî ev mijarên ku li jorê behsa wan hatiye kirin, tene dîtin an na? Di vê xebatê de em dê hewla bersivdana vê pirsê bidin.

Bi kurtî dê mînakên têkildar bi wan mijarên li jorê ku behsa wan hatiye kirin di herdu berhemên de bêne destnîşankirin û dê bê dîtin ka ta çi radeyê Xanî kariye mîna Feqî li ser van mijaran raweste.

#### 2.1.1. Tewhîd û Işqa Îlahî

Di edebiyata Îslamî de ku ya kurdî jî beşek jê ye, piraniya helbestvanên klasîk wek tradîsyonekê bi tewhîdê dest bi berhemên xwe kirine. Di beşa tewhîdê de ku destpêka berhemê ye, helbestvan behsa yekbûna Xwedê dike. "Di edebiyata klasîk de çi menzûm çi peşan hemû metnên edebî yên ku di wan de li ser yekîtiya Xwedê, sifet û mezinahiya wî tê rawestan wek tewhîd hatine binavkirin." (Adak, 2019, r. 149).

Feqî jî mezûmeya xwe mîna piraniya berhemên klasîk bi beşa tewhîdê dest pê kiriye, dibîne ku Xweda di ser her tiştî re ye û rihê mirovan ji nûr û pertewa Xweda ye; bê qudreta Xwedê tu kes nikare bilive û dibîne ku eşqa mecazî ya beşerî ye û ew eşqa ku ruh dixwaze eşqeke îlahî ye.

#### Feqî

Rûh û rewanê beşer î  
'Aşiq û me şûq tên berî  
Ew li serî bûn muşterî  
Sahib-dilê nûr veketê

Dil kewkeb e, mexlûq e ew  
Leş qefes e sinduq e ew  
Qelban xerez me'sûq e ew  
Hemyan diwêt wehdanetê

#### Xemgîn

Ji ru'yeta Pêxember î  
'Aşiq ku tene hember î  
Dîtin di demê esmerî  
Kêşanê dert û mihnetê

Mihnet nekêşî roj û şev  
Zikir nekî bi qelb û dev  
'Îşq û evîn naîne hev  
Îlla bi ferz û sinnetê



Xemgînê Xanî jî mîna Feqî bi riya hezretî Pêxember behsa yekîtiya xwedê di destpêkê de dike. Dûvre behsa eşqa îlahî dike ku eşqa heqîqî ew e. Çawaniya gihiştina wê eşqê şirove dike ku ew jî bi riya kişandina mihnet û zehmetiyan, kirina taet û îbadetên berdewam û pêkanîna ferz û sinetan pêkan dibe. Li xwarê herdû bendên pêşî yên menzûmeya herdu helbestvanan in, weha dest pê dikin:

### 2.1.2. Tesewuf

Li gor tê diyarkirin mijara ku herî rengê wê li menzûmeyê bi şêweyeke berbiçav vedaye, mijara tesewufê ye. Dibe ku sedema vê yekê ew be; bandora Ferîduddînê Etar ku kesekî mutesewuf e, li Feqî bûbe, piştî Feqî berhema wî ya Mentîqut'Teyr ku dikeve kategoriya berhemên tesewufê xwendiyê û pê daxbar bûye. Di vê derbarê de em dikarin hinekî li ser seyra dîrokî ya tesewûfê rawestin û nas bikin gelo tesewûf kengî dest pê kiriye û gotina sofi ji ku hatiye?

Li gor dîrokzanê frensî Masînyon: peyva sofi cara pêşî di dîrokê de di nîvê duyem ê sedsala heştan a zayînî de ji bo du kesan hatiye gotin: kîmyazanê şîfî Cabir bin Heyan ku ji bajarê Kûfê bû û mezhebeke wî ya taybet hebû û ji bo Ebû Haşim Elkûffî. (Zehîr, 1986, r. 42).

Hin dibêjin ji ber saffîbûna sirê wan û paqîjiya paşmayên wan wek sofi hatine binavkirin. Hin jî dibêjin sofi ew in ên ku niyet û karê wan tenê ji bo xwedê ye. Hin jî dibêjin sofi ew in ên ku di sef an jî rêza pêşî de li ber destê Xwedê ne û hin jî dibêjin ji ber ku wan cilên hirî ku bi Erebbî "sûf" jê re tê gotin, li xwe dikirin; lewma navê wan bûye sofi. (Zehîr, 1986. r. 20-21).

Ev kesên ku navê sofi li wan hatiye kirin, hinan ji wan terka welatê xwe û malê xwe dikirin û kêma xwarin dixwarin û her demê cilê hirî li xwe dikirin û wan tenê ji axretê re kar dikir û dest ji dinyayê berdabûn. Bi şev û roj îbadet dikirin da ku Xweda ji wan razî be.

Diyar e ku şêxê Sen'anî jî taybetmendiyên kesê mutesewûf li rex wî hebûn. Jiyana xwe hemû ji bo taet û îbadetê terxan kiriye, wek zahidekî jiyana xwe derbas kiriye û ji vê dinyayê ji bilî taet û zîkr û nimêjê jê re tiştekî dî giring nebû.

Di van malikên xwarê yên Feqî û Xemgîn de, Feqî daye xuyakirin ku qet şêxê Sen'anî bi hezkirina dinyayê re nedihat girêdan û tu carî ne li deverên ku kêf û şahî lê hebûn ne jî yên şîn û huzin lê hebûn hazir nedibû. Şêxekî zahid bû û her demê bi taetê mijûl bû ku ev jî taybetmendiyên kesên mutesewûf in. Xemgîn jî mîna Feqî behsa şêx dike ku ji xelweta xwe dervediket û wek kesekî zahid jiyana xwe diborand û ji ber taet û îbadeta bi şev û roj, kêmxewî û kêmxwarinê zer û zirav mabû.



### Feqî

Dûr bû ji ber menahîyan  
Ned'hate 'îd û şahîyan  
Ji ber selat û cêhîyan  
Şêrîn dihatin ta'etê

Ta'et dikir daîm û dam  
Gih ji qu'ûd gih ji qîyam  
Heftê û heft salên tamam  
Xalî nebû ji xizmetê

### Xemgîn

Ta'et dikir wî roj û şev  
Zikir dikir bi qelb û dev  
Çav li xewê ne'd dane hev  
J'hubba Xwedê wî xew netê

Qîmet nekir mal û dirav  
Îlla suluk û î'tîkaf  
Ji ta'etê zer bû zirav  
Şev roj ji xelwê dernetê

### 2.1.3. Evîn û Dildarî

Herweha mijara evîn û hezkirinê mijareke sereke ye di vê menzûmeyê de. Feqî salixê hezkirina Şêx ji keçika ermenî re bi şêweyekê dide ku dihêle mirov bi rastî hest bi wê evînê bike û axîn û azarên ku wî ji ber wê evîn û hezkirinê dikişandin bibihîze. Feqî dibêje ku dema çavên Şêx li çavên dilberê dikevin, ew çav mîna tîrên dijwar li dil û mêlagê wî bidin û dilê şêx bi kûrî birîndar bikin. Xemgînê Xanî jî behsa vê evînê dike û wê dişibihîne bi evîna Ferhad û Şêrîn, Leyla û Mecnûn û bi riya bikaranîna wêneyên dilşewat yên ku halê evîndaran didin xuyakirin, hiştiye xwendevan hest bi wî agirî bikin ku di dilê wî şêxê evîndar de vêketiye.

Di van malikên xwarê de hem Feqî û hem jî Xemgîn weha behsa evîna Şêx ji keçika ermenî re dikin:

### Feqî

Sohtim xezala çav xurab  
'Eşqa te ez kirme kebab  
Sotim biraştim bêhîsab  
Berqa 'uyûnan vêketî  
Herdu 'uyûnan berq veda  
Ji gezma kevanê esweda  
Tîrek li mêlaka me da  
Hetta qîyamet dernetê.

### Xemgîn

Nûra te bû şîrîn hevest  
Ferhad ji 'îşqê maye mest  
Lewra dibû me'şûq-perest  
Lewma xwe kuşt bi wê 'ibretê  
Nûra te bû leyla di dêm  
Birbû ji Qeys aqil û fêhm  
Dîn bû kete sehra û dêm  
Mabû li xabê xurbetê.

### 2.1.4. Wefadari

Menzûmeya Şêxê Sen'anî di hundirê xwe de wate û nîşanên wefadariyeke berbi-çav dihewîne. Ew sofiyên bi şêx re ne, ji ber qencyên bêhejmar ên şêxê wan li ser wan, wefadariyeke bêhempa ji şêxê xwe re diyar dikin. Digel ku şêxê wan aqilê xwe ji dest dabû jî, wan dixwest ku wî bisitirfîn û eybên wî veşêrin û pê re dikevin rêweke dût û dirêj da dilê wî rehet bikin û merema wî bi cih bînin û di dawiyê de bi xêra wefadariya Şêx Etarê Sadiq û sofiyên din aqilê şêx tê serê wî û vedigere ser riya rast.

Hem di nivîsa Feqî û hem jî di ya Xanî de, bi şêweyeke aşkera wefadariya sofiyan ji şêxê wan re diyar e:

**Feqî**

Ya qenc ew e mestûr bikin  
Nabit surrê meşhûr bikin  
Rabin ji 'amê dûr bikin  
Bi derkevin ji Hêşyetê

Ji Hêşyetê bi derkevin  
Pênsed murîd bi ber kevin  
Pêşber keça dîlber kevin  
Zahir biçîne hedretê

Em dê subeh xwe kar bikin  
Şêx l'hespekî suwar bikin  
Qesda derê dêra bikin  
Go bikin ji ber derûretê

**Xemgîn**

Şêxê me şêxek 'alim e  
Merteb çî mîr û hakim e  
Xidmet li ser me lazim e  
Jê re bikin rî'ayetê

Em dê bibin pêş dilberê  
Wê nazîkê lib-şekkirê  
Da kul ji dil bêne derê  
Bes ew bikêşit mihnetê

Da ew nekêşit van kula  
Bilbil bibînit sorgula  
Şafî bibin derdê dila  
Demek bikefte rahetê.

Herweha di van herdu bendên xwarê yên Feqî û Xemgîn de jî wefadarî û dilsoziya hevalê Şêxê Sen'anî yê bi navê Etarê Sadiq tê diyarkirin, Etarê Sadiq gazindan ji mirîdan dike ku çawa Şêx di nav wî qewmê kafir de hiştine û bêyî wî vegeyriyane welatê xwe.

**Feqî**

Qenc bû hemû heval bûwan  
Tabî'ê Şêxê kal bûwan  
Nêzîkî qewmê dal bûwan  
Ser xatirê ehlîyetê.

Qenc û qewî ew ji we ra  
Ji nav û namûsa we ra  
Kafir biban bi şêxê xwe ra  
Maban li ser wê teb'etê

**Xemgîn**

J'bo çî we hişt hûn hatne mal  
We hişt di nêv qewmê dalal  
Hemû bi wî re ban heval  
We lê bikra hîmayetê

Bilcumle hûn ne sadiq in  
Ne'l ser wê 'ehda Xaliq in  
Hûn ne murîdê mutliq in  
Tev muflis in ji himmetê

**2.1.5. Bandora Şêx Ya Mezin Li Ser Hemû Beş û Çînên Civakê**

Herweha tiştê ku bala mirov dikişîne, Şêxê Sen'anî ne wek şêxekî normal e ku mirîdên wî tenê xelkên ji rêzê bin; lêbelê ta bi hakim û desthilatdaran jî li ber destê wî tobe dikirin, rêz û hurmeta xwe jê re diyar dikirin. Hem Feqî û hem jî Xemgîn di van bendên xwarê de bandora Şêx ya mezin li ser civakê dane xuyakirin:

Feqî	Xemgîn
Şêxek hebû cara ewwil	Kafirê Dêra Kelaê
Nûra Xweda hebû di dil	Şêx nezer carek bidaê
Sed zalim û dal û mudil	Ew di cih de tête raê
Ber destê wî tîn tobetê	Bi enfas û kerametê
Ew mela bûn ew emîr bûn	Wî keramet pir bedî bûn
Ew geda bûn ew feqîr bûn	Zalim bi wî re mutî' bûn
Têk û vêk guhdarê pîr bûn	D'xidmeta wî de serî' bûn
Ji 'eşqa dîn û şewketê	Her dihatin suhbetê

## 2.2. Berawerdî ji Aliyê Teşeyên Nezmê ve

### 2.2.1. Teşeyê Nezmê

Teşeyê nezmê awayê ku heykelê nezmê yan helbestê yê derveyî li gora wê hatiye avakirin e,

Teşeyên nezmê ji aliyê yekeyê ve li ser sê beşan tîn dabeşkirin:

- 1- Teşeyên nezmê yên ku ji misrayan pêk tîn
- 2- Teşeyên nezmê yên ku ji beytan pêk tîn
- 3- Teşeyên nezmê yên ku ji bendan pêk tîn. (Adak, 2019, r. 97).

### 2.2.2. Teşeyên Nezmê Yên Ku ji Misrayan Pêk Tîn

Teşeyên nezmê yên ku ji misrayan pêk tîn ew jî dibin:

- a- Teşeyên ku ji misrayekê pêk tîn an jî azade.
- b- Yên ji du misrayan pêk tîn an jî mufred.
- c- Yên ji çar misrayan pêk tîn û ev jî dibin du beş:
  - 1- Ruba'î
  - 2- Dubeytî

### 2.2.3. Teşeyên Nezmê Yên Ku ji Beytan Pêk Tîn

Teşeyên nezmê yên ji beytan pêk tîn dibin du beş:

- A- Yekserwa: ew jî dibin sê beş:
  - Qesîde
  - Xezel
  - Qit'e
- B- Cotserwa: ew jî ji mesnewiyan pêk tîn (Adak, 2019:102).

### 2.2.4. Teşeyên Nezmê Yên ku ji Bendan Pêk Tîn

Menzûmeya Şêxê Sen'anî ya Feqiyê Teyran ji aliyê teşeyê nezmê ve ji ber ku ji bendan pêk tê û her bendek ji çar misrayan pêk hatiye, bi şeweya murebeê ye. Menzûmeyên ku yekeya wan bend e, hemû bendên wan ji çar misrayan pêk tîn û ji aliyê helbestvanekî

ve bi heman kêşê û bi awayekî pirsêrwa hatine nivîsîn wek “murebbe” tên binavkirin (Adak, 2019, r. 371).

Teşeya Murebbeê yek ji teşeyên kevin û bingehîn ê helbesta kurdî ya klasîk e. Di kurdiya kurmancî de di sedsala XVIem de hem ji aliyê Melayê Cizîrî hem ji aliyê Feqiyê Teyran ve ev teşe hatiye bikaranîn. Lêbelê Feqî ji Mela gelekî zêdetir ev teşe bi kar aniyê. Murebbe teşeya sereke ya helbestên Feqî ye (Adak, 2019, r. 371).

Feqî menzûmeya xwe bi şêweya **Murebe’a Muzdewica Bêmetle’** nivîsiye. Berhema Xemgînê Xanî jî bi heman teşeyê hatiye nivîsandin.

### 2.3. Berawirdkirin ji Aliyê Serwayê ve

Feqî menzûmeya xwe bi şêweyê **Murebe’a Muzdewica Bêmetle’** nivîsiye, “di vê şêweyê de her sê misrayên pêşî ên benda yekem hemserwa ne, misraya çarem cuda ye; di bendên peyrew de misrayên dawî bi misraya çarem a benda yekem re û misrayên berî wê di nav xwe de hemserwa ne”, di vê şêweyê de şemaya serwayê weha ye: aaab, cccb, dddb... (Adak, 2019, r. 374).

Xemgînê Xanî ji destpêkê û ta dawiya berhema xwe, di misraya çarem de pabendî bi serwaya ku Feqî di misrayên çarem de ji destpêka menzûmeya xwe û ta dawiya wê bi kar aniyê kiriye û her sê misrayên pêşî jî ji bendên wê di nav xwe de hemserwa ne. Di vê derbarê de em karin bêjin ku Xemgîn di berhema xwe de heman serwaya Feqî bi kar aniyê û ta dawiya berhemê berdewam maye.

Li xwarê herdu bendên pêşî û yên dawî ji ya Feqî û ya Xemgînê Xanê ne.

Herdu bendên pêşî:

#### Feqî

Rûh û rewanê beşer î  
‘Aşiq û me şûq tên berî  
Ew li serî bûn muşterî  
Sahib-dilê nûr veketê

#### Xemgîn

Ji ru’yeta Pêxember î  
‘Aşiq ku têne hember î  
Dîtin di demê esmerî  
Kêşanê dert û mihnetê

Dil kewkeb e, mexlûq e ew  
Leş qefes e sinduq e ew  
Qelban xerez me’şûq e ew  
Hemyan diwêt wehdanetê

Mihnet nekêşî roj û şev  
Zikir nekî bi qelb û dev  
‘Îşq û evîn naîne hev  
Îlla bi ferz û sinnetê

Herdu bendên dawî:

#### Feqî

Şêx rasixê ‘ehda xwe bû  
Ber emrê mehbûba xwe bû  
Ageh bi dunyâê nebû  
Ji xeyrî ‘eşq û muhbetê

#### Xemgîn

Bi hev re mirin herdu heval  
Çûne lîqaya Zu’l-Celal  
Seyran li mulkê bêzewal  
Govend û reqs û dawetê

Şêx bi himmet û kerametê  
Keçik ji nav wê zulmetê  
Kêşabû nêv selametê  
Subhan ji Şahê Qudretê.

Govend û saz û celcela  
Zava û bûka muhtela  
Dê reqşin şêx û mela  
Li hava buhara cinnetê.

#### 2.4. Berawirdkirin ji Aliyê Erûzê ve

Wek tê zanîn zanista erûzê ji aliyê Xelîlê kurê Ferahîdî ve hatiye dayîn û weznên helbestê li rex ereban şazdeh wezn in ku şazdeh behran pêk tînin û navê van behran ev in: Tewîl, Medîd, Besît, Wafir, Kamil, Hezec. Recez, Remel, Serî, Munserih, Xeffî, Mudari, Muqtedeb, Mujtes, Muteqarib, Mutedarek (Kalo, 2017-2018, r. 3).

Helbestvanên kurd ên klasîk jî helbest li gor hin qalibên erûzî yên kurê Ferahîhîdî nivîsandine û “piraniya tefileyên ku helbestvanên kurd bi kar anîne ev in: (mefa’îlun, fa’îlatun, fe’ûlun, mustef’îlun), dibe sedema wê yekê ji ber hêsaniya bilêvkirina van tefileyên û dengê wan ê xweş be” (Doskî, 1993, r. 81).

Feqî di hemû helbestên xwe de ew qalibên erûzê bi kar aniye ku ji du tefileyên çarbirgeyî pêk tînin, ji 32 helbestên wî yên ku hatine berhevkirin 18 heb bi kêşa “mustef’îlun mustef’îlun”, 8 heb bi kêşa “mefa’îlun mefa’îlun”, 3 heb jî bi kêşa “fa’îlatun fa’îlatun” hatine nivîsîn. Ji ber ku teşeyên ku Feqî bi kar anîne kêma in, qalibên kêşê jî kêma in. (Adak, 2019, r. 371).

Li xwarê rûpelek ji menzûmeya Feqî û yek ji ya Xemgînê Xanî ji aliyê erûzê ve hatine parçekirin û tefileyên wan hatine danîn; wek ku tê dîtin herdu helbestvanan jî berhema xwe li gor behra recezê bi kêşa “mustefîlun mustefîlun” nivîsandine û tefileyên rast yên ku şikenandin di wan de tune bi rengê zer hatine destnîşankirin. Eger em wek berwawirdkirinê di navbera herdu rûpelên vekîtkirî de bikin û pabendiya herdu helbestvanan bi bikaranîna tefileyên rast bibînin wê encam weha be:

#### Feqî

Rûh û rewanê beşer î  
/ / - / / - - /  
‘Aşiq û me’şûq tînin berî  
/ - / / / / - /  
Ew li serî bûn muşterî  
/ - - / / / - /  
Sahib-dilê nûr veketê  
/ / - / / / - /  
Dil kewkeb e, mexlûq e ew  
/ / - - / / - /  
Leş qefes e sindûq e ew  
/ - - - / / - /  
Qelban xerez me’şûq e ew  
/ / - / / / - /

#### Xemgîn

Ji ru’yeta Pêxember î  
- / - / / / - /  
‘Aşiq ku tîne hember î  
/ / - / - / - /  
Dîtin di dêmê esmerî  
/ / - / / / - /  
Kêşane derd û mihnetê  
/ / - / / / - /  
Mihnet nekêşî roj û şev  
/ / - / / / - /  
Zikir nekî bi qelb û dev  
- / - / - / - /  
‘Îşq û evîn naîne hev  
/ / - / / / - /

Hemyan divêt wehdanetê / / - / / / - /	Îlla bi ferz û sinnetê / / - / / / - /
Hemyan murad eslê xwe ye / / - / / / - /	Hubbê ji xwe neke ferîq / / - / / - - /
Ten sedefa canê me ye / - - / / / - /	Serxweş bibe tê de xerîq / / - / / - - /
Rûh pertewa nûra te ye / / - / / / - /	Dê tu gihê 'eşqa heqîq / - - / / / - /
Hewl û qewet ji bal te tê / / - / - / - /	Weqtê vexwî wê şerbetê / / - / / / - /
Qet bêyî te rûh nalivin / / / - / / - /	Ger fir nekî fincan û cam / / - / / / - /
Zulfa di şeng ser nacivin / / - / / / - /	Serxweş nebî daîm û dam / / - / / / - /
Agir bi qelban nakevin / / - / / / - /	Qet nagihî 'işqa tamam / / - / / / - /
Narê mecaza hikmetê / / - / / / - /	Qenc guh bide ser vê xetê. / / - / / / - /

Me çar bend ji rûpelekê ji yên Feqî û çar bendên rûpele Xemgîn birine. Di her bendekê de çar misra hene û di her misrayekî de du tefile hene bi vî awayî, di her rûpelekî ji yên herdû helbestvanan de wê sih û du tefile hebin.

Piştfî ku me tefileyên herdu rûpelan danîn, diyar e ku Feqî di çar bendan de pabendî di bîst û sê tefileyên de bi erûzê kiriye û Xemgînê Xanî di bîst û pênc tefileyên de pabendî bi erûzê kiriye.

Di encamê de herdu helbestvanan hewl dane ku li gora behra recezê bi kêşa "musteffilin musteffilun" helbesta xwe binivîsin û rêjeya pabendiya herduyan jî nêzîkî hev e. Dibe ku herdu helbestvanan li ser movikan jî helbesta xwe nivîsîbin; ji ber ku helbestvanên kurd carinan bêyî ku pabendiyê bi erûzê bikin jî, li gor mûzîka hundirîn ya helbestê ta radeyeke baş kêşa helbestên wan dîsa di dirûvê erûzê da ye.

## 2.5. Berawirdkirin ji Aliyê Qebareyê ve

Xemgînê Xanî Menzûmeya Feqî di rûpelekê de û ya xwe di rûpeleke din de beramberî ya Feqî nivîsandiy. Rûpelên Feqî ji pênc bendên çarmisra pêk tên, yên wî ji çar bendên çarmisra pêk tên, di encamê de Feqî 384 bend nivîsandine û Xemgînê Xanî 308 bend nivîsandine.

Li gor çapa Nûbiharê ya ji aliyê M.Xalid Sadinî ve hatiye amadekirin, menzûmeya Şêxê Sen'anî ji 363 bendan pêk tê yan jî dibe ku Xemgîn hin bend li ya Feqî zêde kiribin yan jî çapa li rex wî ev bendên zêde tê de hebûn.

## 2.6. Berawirdkirin ji Aliyê Bikaranîna Gotinên Biyanî ve

Li xwarê me heşt bend ji yê Feqî û heşt bend ji yê Xemgîn birine û peyvên biyanî di wan bendan de bi rengê sor destnîşan kirine.

### Feqî

'Îlmê **terîqa** 'aqlan  
Hal herne **mewca xafilan**  
Lê babeta ehlê dilan  
**Xaliq** dizanî **hikmetê**

Mîr **hekîm** e pê dizanê  
Şêx tebat naê di xanê  
Xelîfa hatin nehanê  
Da li Şêx kin şîretê

Yek nehin **ciz'ek** di dest ne  
Ser nehin perdek **qefes** ne  
Kes nehin **hewceê** kes ne  
Ji **qedr** û halê **himmetê**

Sofiyan **sahib-kemala**  
Têk vêk tev çûne bal e  
Hemmîyan jê kir **suala**  
Ev çi tirs e bi ser te tê?

### Feqî

Sofiyan b'erkan û şerm e  
Şêx demek axaft ji nerm e  
Vê surê **kifş** ke li ber me  
Da dewa kin **'illetê**

Şêx go **hekîm** 'Îsa bitin  
Loqman ji **qebrê** rabîtin  
Daxa derman nabîtin  
Destê **hekîman** lê netê

Daxa piringa sor li ser  
Hetta sipêde bête der  
Aram in xew naê ji ber  
Sebr û **sikûna** min netê

Şêx li xwe nakit **sitar e**  
Eşkere xewn gote yar e  
Ah j' destê dohta **kufar e**  
Birme dînê **şirketê**

### Xemgîn

Şêx ji 'işqê dîn û gêj e  
Nakîtin **ferdek** nimêj e  
**Meqseda** xwe'j bo me bêje  
Da em bizanin çi' b te tê

Şêx li wan serî ne hilda  
J' **elem** û êşa di dil da  
Lerze bû **cezbe** di mil da  
Nabîhit yek **kilmetê**

Nabîhit ew yek **kelamê**  
**Îltîfat** nedikir li **'amê**  
Serxweşî wê mey û camê  
Çûye halê **herqetê**

Dil çûwe ser zilf û xalan  
Lew dikit fikr û mitalan  
**Firqeta** wan **nûn** û **dalan**  
Ahîn ji **xewrê** dil ve tê.

### Xemgîn

Sorgul ne wek wê sor û şîn  
Bilbil ne wek min dilbixwîn  
**Mecrûh** ne wek min dilbirîn  
Danîm ji hêl û **quwwetê**

Danîm ji fikr û **terbîya**  
Îdî neşim rabim pîya  
Dirand **hîcaba** şermîya  
Birme **lîqaya** babetê

Xalên li nik dêmê binûr  
Zendê sipî zilfên dihûr  
**Mecrûh** kirim dil bû tenûr  
Negrin li min vê **lometê**

Zehmet ev e ez ketimê  
**Mecnûn** kirim wê zalimê  
Şermî kirim ji vê 'alemê  
Ez dîn kirim **bêmirwetê**.



Eger em gotinên sor yên di bendên herdu helbestvanan de bijimêrin, em ê bibînin ku hejmara gotinên biyanî û bi taybetî bi zimanê erebî di her heşt bendên Feqî de 23 gotin in û di her heşt bendên Xemgîn de jî 22 gotin in. Ev tê wateya ku rêjeya bikaranîna herdu helbestvanan ji gotinên biyanî re gelekî nêzîkî hev e û Xemgînê Xanî ta di vê xalê de jî li ser şopa Feqî çûye.

### Encam

Wek ku tê dîtin, Xemgînê Xanî ji her alî de kariye berhemekê binivîse ku li gora hemû şert û mercên berhemeke klasîk be, ta radeya ku mirov dema berhema wî dixwîne nizane ku ev berhem di serdema nûjen de hatiye nivîsandin. Mirov hest bi wê yekê dike ku ev berhem helbestvanekî ji helbetvanên serdema klasîk nivîsandiye. Bi giştî piştî vê berawirdkirina ku li jorê di navbera herdu berheman de hate kirin, mirov dikare bigihêje van encaman:

- Xemgînê Xanî kariye ji aliyê naverokê ve mijarê bi şewazeke pir nêzîk ji şewaza Feqî şirove bike, ta radeya eger kesek vê berhemê bixwîne bêyî ku zanibe Xanî lê zêde kiriye wê hest bi wê yekê bike ku berhem tev ya Feqî ye; ji ber ku heman mijarên ku Feqî di çîrokê de behsa wan kiriye Xemgînê Xanî jî behsa wan kiriye û heman peyv û têgehên Feqî bi kar anîne.
- Ji aliyê teşeyên nezmê ve teşeya nezmê ya ku Feqî menzûmeya xwe li gor wê nivîsandiye, Xemgîn jî berhema xwe li gor heman teşeyê nivîsandiye. Herdu helbestvanan bi şeweya mureba muzdewica bêmêtle nivîsîne.
- Ji aliyê erûzê ve Feqî menzûmeya xwe li gor behra recezê nivîsiye, Xemgînê Xanî jî li gor heman behrê berhema xwe hûnaye.
- Ji aliyê serwayê ve Xemgîn ji destpêkê ta dawiya berhema xwe pabendî bi heman serwaya ku Feqî bikar aniye kiriye.
- Ji aliyê qebareyê ve hejmara bendên Feqiyê Teyran ji yên Xemgînê Xanî zêdetir in. Bendên Feqî li gor vê berhemê 384 in, yên Xanî 308 bend in. Wek li jorê jî hat gotin, li gor çapa Nûbiharê ya ji aliyê M. Xalid Sadinî ve hatiye amadekirin, menzûmeya Şêxê Sen'anî ji 363 bendan pêk tê. Dibe ku Xanî hin bend li ya Feqî zêde kiribin yan jî çapa li rex wî ev bendên zêde tê de hebûn.
- Herweha ji aliyê bikaranîna gotinên biyanî ve rêjeya bikaranîna herdu helbestvanan heta radeyeke mezin wek hev e.

Ji ber ku berhema Xemgînê Xanî bi heman teşe, kêş û serwa ya berhema Feqî hatiye nivîsîn û ji aliyê naverokê jî heman mijar in, li gor pênaseya têgeha nezîreyê mirov bi rehetî dikare bêje ku Xemgînê Xanî nezîreyek ji menzûmeya Feqî re nîvisiye û ji aliyê edebî ve berhema Feqî zengîntir kiriye. Herweha ji aliyê hunerî ve bi hilibijartina wî ji peyv û gotinên têkildar bi mijarê re çîrok ciwantir kiriye. Mîna ku menzûmeya Şêxê Sen'anî ya Feqiyê Teyran tabloyeke hunerî be, Xemgîn jî hatiye û bi neqşên xwe yên

edebî ew tablo rengîntir û ciwantir kiriye. Xalên ku Feqî behsa wan nekiriye anîne ziman, mijar bêhtir li ber xwendevan zelal kirine, ji her alî de çîrokê temam kiriye. Diyar e ku Xemgînê Xanî helbesta klasîk bi asteke edebî ya bilind hûnaye û hêja ye berhemên wî yê din jî bigihên ber destê xwendevan û hezkerên edebiyata kurdî ya klasîk ta ku ev helbestvan bêhtir were naskirin û berhemên wî bîn xwendin.

### Çavkanî / References

- Adak, A. (2015). *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasik*. Çapa 3. Stenbol: Nûbihar.
- Adak, A. (2016). "Şewqiyê Xanî li Pey Şopa Ehmedê Xanî: Berawirdkirinek li Ser Mulemme 'ên Wan ên Çarzimanî". *Nubihar Akademi*. 3(5). r. 37.
- Adak, A. (2019). *Teşeyên Nazmê di Edebiyata Kurdî ya Klasik de*. Stenbol: Nûbihar.
- Cum'e, B. M. (2002). *Mentiqu't-Teyr li Ferîduddîn 'Ettar en-Nîsabûrî, Daru'l-Endulus li't-Tîba'e we'n-Neşr we't-Tewzî'*.
- Doskî, T. Î. (1993). *el-Medxel li Dîrasetî'l-Edebi'l-Kurdî el-Mudewwen bi'l-Lehce eş-Şimalîyye*, Dihok: Cem'iyet Ulemau Kurdistan.
- Gemî, A. û Jankîrî A. (2022). *Dîwana Şêxê Sen'anî bi Xezela Feqhê Teyran û Xemgînê Xanî*. Wan: Peywend.
- Gemî, A. (2016). "Feriduddin Attar'ın Etkisinde Gelişen Gülşehrî ve Feqiyê Teyran'ın Şeyh San'an Hikâyesinin Mukayesesi". *Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi*. 9(45). r. 107-115.
- Gemî, A. (2023). *Feqiyê Teyran û Şêxê Sen'anîya Wî, Sê Stêrkên Rojhilatê*. Ankara: Sonçağ Yayınları.
- Kalu, M. M. (2017), *el-Edebu'l-'Erebî 'Ebre'l-'Usûr, Cami'et Adiyeman*.
- Kurdo, Q. (2019). *Tarîxa Edebiyata Kurdî*. Çapa 4. Amed: Lîs.
- Mustefa, M. (1938). *el-Edebu'l-'Erebî we Tarîxuhu fî 'Esrî Sedri'l-Îslam we'd-Dewle el-Emewîyye*, Qahire: Metbe'et Mustefa el-Babî el-Helebî.
- Qenawî, E. E. (1949). *El-Wesf fi's-Şi'r el-Erebî*, Qahire: Metbe'et Mustefa el-Babî el-Helebî.
- Sadinî, M. X. (2020). *Feqiyê Teyran "jiyan, berhem û helbestên wî*. Çapa 10. Stenbol: Nûbihar
- Sağniç, F. H. (2014.). *Dîroka Wêjeya Kurdî*. Çapa.2. Stenbol: Enstîtuya Kurdî ya Istanbulê.
- Xanî, X. (2007). *Dîwana Şêxê Sen'anî bi Xezela Feqhê Teyra û Xemgînê Xanî*. Stokholm: El-Yanabia.
- Zivingî, N. (2021). *Stêrkên Edebiyata Kurdî*. Çapa 2. Amed: Dara.
- Zehîr, Î. E. (1987). *Et-Tesewwuf el-Menşe' we'l-Mesadir*, Pakistan: Îdaret Tercumani's-Sunne.

### Extended Abstract

The art of classical literature has preserved its splendor and esthetical, some contemporary poets also wrote poetry in the same style and by writing their poems in the classical style they played a role in continuing to preserve the authenticity of classical poetry. Among these contemporaries is the poet Ghamkini Khani, who lived in the twentieth and early twenty-first centuries and whose style followed in the footsteps of classical poets such as Malay Jaziri, Faqih Tiran, and Ahmad Khani. Among his works was the poetic story that was similar to the poetic story "Sheikhi Sanaani" by Faqi Tayaran.

The study attempts to make a literary comparison between the story of Sheikh Sana'ani by Faqih Tayran (1563-1632) and its counterpart by the poet Ghamkini Khani (1915-2008). The comparison tool is in terms of the topics that both poets dealt with, such as monotheism, Sufism, divine love, love and sincerity, and loyalty in addition to the great influence of the Sheikh on all classes of society, it was found that Ghamkin wrote in a manner very close to the style of Faqih Tayaran. Also, the comparison was made in terms of the poetic form used by both poets, it was concluded that Al-Faqih wrote his poem in the style of the double quatrain (tetrastich), without verse of the poem., and Ghamkin also wrote in the same poetic form. The comparison was made in terms of the poetic meters and metres, and it became clear that Al-Faqih wrote his poetic story in the Rajaz meter, and Ghamkin used the same style.

The two poems were compared in terms of rhyme, In the fourth line of each stanza, Gamkin remained committed to the same rhyme pattern from the beginning of the story until its end, and the first three lines of each stanza share the same rhyme.

The two works were compared in terms of size, and it was found that Gamkin wrote his verses on pages opposite to Faqih's verses. Each page of Gamkin consists of four verses, while each page of Faqi contains five verses. It is clear that the volume of Faqi's work is greater than that of Gamkin. Faqi wrote 384 verses, while Gamkin Khani wrote 308 verses. According to the Nobahar edition of the story of Sheikhi San'ani prepared by Mohammad Khalid Sadini, the story consists of 363 stanzas. Khani may have added some stanzas to Faqi's book, or the edition he had contained those additional stanzas. A comparison was also made in terms of the use of foreign words by the two poets, and it was found that both of them used foreign words in somewhat the same proportion.

In the end, we can say that both works are written in the same poetic form, the same meter, the same rhyme, and the content is the same. According to the definition of the concept of counterpart, we can say that Gamkini Khani wrote a counterpart to Faqi Tiran's poetic story and enriched Faqi's work in terms of literary and artistic aesthetics. His choice of words and phrases related to the subject made the story more eloquent, so we can say that Gamkin wrote classical poetry at a high literary level and deserves that his other works be printed and reach readers so that they can see the high literary level at which this poet wrote.